# JINEOLOJÎ



# DANASÎNA JINEOLOJÎ

# BEŞA YEKEMÎN

*AKADEMIYA JINEOLOJÎ*
*YA ŞENGALÊ*

Jineolojî



*Diyarî Şehîda heqîqetê Ş. Nagîhan Akarsel û hemû Jinên tekoşer …*

## *NAVEROK*

1. PÊNASEYA JINEOLOJÎ

- *Wateya 'Jineolojî'*
- *Di Derbarê Jin Û Jineolojî De Nêrînên Rêbertî*
- *'Çima Jineolojî?' Û Girîngiya Xebatên Jineolojî*

2. BINGEHÊN JINEOLOJÎ

- *Ceribandin Û Tecrûbeyên Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê*
- *Zanînên Çanda Xwedawendî Û Civaka Xwezayî*
- *Berxwedan Û Têkoşînên Jinên Cîhanê*

# 1. PÊNASEYA JINEOLOJÎ

## ***Wateya Jineolojî***




Peyva 'Jineolojî' cara yekem Rêber Apo di sala 2008'an de di parêznameya xwe a sêyemîn ya **'Sosyolojiya Azadiyê'** de tîne ziman. Peyva 'Jineolojî' ji peyva 'jin' ya zimanê kurdî û peyva 'lojî' ya zimanê latînî ku tê wateya 'zanist' pêk tê. Weke peyv tê wateya 'zanista jinê', lê Rêber Apo peyva '*Jin*', '*Jîn*' û '*Jiyan*' weke heman kok digire dest. Lewma Jineolojî weke wateya nav **'zanista jin û zanista jiyanê'** ye.

Bi vî awayî Jineolojî hemû şax û qadên Jiyanê weke **dîrok**, **aborî**, **sinc û bedewbûn (etîk û estetîk)**, **polîtîka**, **jîngehnasî (ekolojî)**, **tendirûstî**, **demografî perwerde** û **xweparastin** di nava xwe digire. Wekî din zanista Modernîteya Demokratîk, zanista bingeha Netewa Demokratîk, zanista civaka ahlaqî û polîtîk, zanista hevjiyana azad û zanista civaknasî ye. ***Zanista şoreşa jin û şoreşa jiyanê ye.***

## *Di Derbarê Jin Û Jineolojî De Nêrînên Rêbertî*



Gelek rexneyên Rêbertî ji bo zanista heyî hene. Esas erkê zanistê ew e di jiyanê de, her alî rol bileyize, pirsgirêkên jiyanî û civakî rast tehlîl û çareser bike û jiyanê ronî bike. Pêwîste derdê zanistê ya heqîqet ronîkirinê hebe. Lê piştî ku bandora desthilatdarî li ser zanistê çêbû, rêbazên lêkolînên zanistê û tehlîlên li ser pirsgirêkên civakî tên rexnekirin. Ji ber vê yekê, di şûna ku pirsgirêkên heyî çareser bikin, bi rêya zanistê pirsgirêkan kûrtir û dijwartir dikin.

Di dîrokê de feylezof Nietzsche yek ji wan kesan bû ku vê zanistê rexne kir û got, ‘Tiştên ku ji me re tên gotin hemû derewin’, got; ‘Yê ku dixwaze xwe bigihîne heqîqetê divê **‘kok’** lêkolîn bike.’ Rêbertî ji bo vê gotina Nietzsche dibêje, ***‘Lêkolîna ku xwe naspêre rastiya jinê nikare bigihêje heqîqetê. Têkoşîna ku xwe naspêre azadiya jinê nagihêje serkeftinê.’*** Nietzsche dibêje divê em kok lêkolîn bikin û xwe wisa bigihînin rastiyê, ew gotina wî, di rêbazê Rêbertî de dizivire; ***‘Di kok de rewşa jinê lêkolîn bike. Rewşa jinê destpêkê çawa bû û piştre çawa bû lêkolîn û fêhm bike. Wê demê mirov dikare xwe bigihîne heqîqetê.’*** Ango di rêbazê Rêbertî de, kok lêkolîn kirin rast e, lê koka dîroka jinê lêkolîn kirin esas e. Hebûna ku herî zêde nehaqî û derew li ser wê hatiye kirin, wê lêkolîn kirin û bi wî rengî derketina rêwitiya heqîqetê li pêş e. Lewma Jineolojî weke peyv wateyeke xwe ya pir felsefîk jî heye.

## Di Derbarê Jin Û Jineolojî De Nêrînên Rêbertî

Rêber Apo taybet zanista civakî 'civaknasî' rexne dike û dibêje, ***'Ger zanista civakî ji bo na civakê be, çima lêkolînên li ser jinê nîne? Lêkolîn û jiyana heyî ne weke hev e. Çareseriyên ku li pêş dixînin çareser nakin, pirsgirêkên heyî kûrtir dikin.'***

Di dîrokê de destpêkê Cîhû dest bi xebatên lêkolîna kolandina erd dikin. Heta wê demê bi israr bûn ku cîhan bi wan destpê dike. Dema lêkolîn kirin peykerên **Xwedawend 'ÎŞTAR- STAR'** dibînin û ji ber ku STAR tazî ye wê weke 'jineke wehşî' bi nav dikin. Lê di cewherê xwe de peykera STAR bereketê temsîl dike. Bi vî şeklî wate û rastiya gelek berhem û şopên dîroka kevnar berovajî kirin û ji bo ku heqîqet û dîroka jin di tarîtiyê de bimîne û neyê zanîn şîrove û pênasekirinên li gor hişmendiya mêr pêş xistin. Ango zanista roja me îro a heyî bi çav û bi nêrîna mêr tê rêvebirin û di bin bandora desthilatdariyê de ye.






**Xwedawenda Evîn û Parastinê 'ÎŞTAR- STAR'**

***Di nava gelê Kurd û civaka Êzîdî de Xwedawend 'STAR' xwedî qîmet û nirxekî bilind e û heta roja me îro gotina '…YA STAR…' di civakê de tê gotin. Di Qewlê Êzîdiyan de ji bo Xwedawend STAR wisa tê gotin:*** ***'Xweda çiyayê Kezwana, çiyayê Şengalê û çiyayê Meqlubê (nêzî Lalîşa Nûranî) ji bo STAR'Ê aniye ser ruyê erdê. Ew her sê çiya weke singên konê Starê ne…'***

## Di Derbarê Jin Û Jineolojî De Nêrînên Rêbertî



***'Xwedawend weke tiştekî îlahî ye. Ew jinên ku şoreşa neolîtîk bi serxistin. Ew tişta ku çerxa jiyanê di xwe de temsîl dike ew pîroz hat dîtin…' R. Apo***

***'Divê jin xwe bîne asta ku weke di demên berê jiyan li derdora wê kom bibe…' R. Apo***

***'Zanista li derdora jinê were pêşxistin, dibe gava yekem a ber bi civaknasiya rast ve…' R. Apo***

Divê jin tenê weke zayendek neyê bidest girtin. Her wiha divê lêkolîna jinê jî tenê bi lêkolîna zayenda jinê ve sînordar nemîne. Ji wê wêdetir divê jin weke bermahî û cewherê civakê were nirxandin û dest girtin. Ronîkirina nasnameya jin ji aliyê dîrokî, çandî û civakî ve ronîkirina rastiyên civakî ne. Ruxmî ku jin çavkaniya civakê û afirînera jiyanê ye, bi ti awayî di zanista civakî de nayê lêkolîn kirin û behs kirin. Wekî din jî zanista civakî erkê xwe yê ronîkirina dîrokê, civakê û bi wê ve girêdayî çareserkirina pirsgirêkên civakî pêk nayînê. Di şûna ku rastî û nirxên jiyanê, dîrokê û civakê biparêze û di sedsala heyî de ji nû ve wateyekî bide jiyanê, zanista di bin bandora desthilatdariyê her ku diçe zêdetir jiyan ji wateya xwe ya rast dûr dixîne û bi kolekirin û bê maf hiştina jinê, tevahî civakê kole dike. Dîsa, bi rastiya jin ve girêdayî, yê di sedsala 21.mîn de bi pêşengtiya jina azad pergala desthilatdar were rûxandin û şoreşa jiyana azad mîsoger bibe.

## *Di Derbarê Jin Û Jineolojî De Nêrînên Rêbertî*

Rêber Apo dibêje, ***“Koletiya jinê li ser axa Rojhilata Navîn çê buye. Ji ber vê sedemê dîsa sererastikirin jî dê li ser vê axê be. ”***



Di serdema **‘civaka xwezayî’** ya berî niha bi hezaran salan, jin ji ber taybetmendiyên xwe yên beden, kesayet, hîsiyat, enerjiya xwe ya herikbar, peywendiya xwe ya ahlaqî-polîtîk li hember civak, jiyan û xweza, ji ber têkilî û girêdanbûna bedena jin bi gerdûn û xwezayê re, zanînên wê yên derbarê sirrên gerdûn û jiyanê, taybetmendiya wê ya zarokanînê û ji ber gelek sedemên din di civakê de pîroz hat dîtin. Her wiha wê demê gelek şoreşên mîna **şoreşa teknolojî, çandinî, gund, kedîkirina sewalan, dewlemendkirin û pêşxistina ziman, aborî, polîtîka, çand, hûner û mûzîk, şoreşa zanistên mîna bîrkarî, kîmya, stêrknasî, kosmolojî** û hwd. ji aliyê jinê ve tên pêşxistin. Lewma Rêber Apo wê demê weke ***‘Dema Şoreşa Jin’*** û jiyana ku di derdora jinê hat afirandin pênase dike.

Lewma civak nasnameya **‘Xwedawendî’** li jinê lê kir û jin erk û berpirsyariya rêveberiya civakê pêk anî. Bi pêşengtiya jin civaka ahlaqî-polîtîk bi rêgezên demokrasî, wekhevî, aşîtî û azadî ava bû. Bi felsefa ‘Yek ji bo hemiyan û hemî ji bo yekî’, civakbûn û nirxên civakbûnê çand û wateya pîroz a jiyanê ya wê civakê bûn.















## Di Derbarê Jin Û Jineolojî De Nêrînên Rêbertî



***"Dîroka koletiya jinê hêna jî ne hatiye nivîsandin. Dîroka azadiya jin jî li bendê ye ku bê nivîsandin. Dîroka koletiya jinê elbet di çanda Rojhilata Navîn de veşartî ye. Ji ber vê yê derketina wê jî li ser vê axê be. Jineolojî dikare bibe derketineke bingehîn." R. Apo***

*"...Ez Xwedawend STAR im.*

*Ez jiyan im.*

*Hûn bibêjin miriye jî, ez Qanûn im.*

*We min dît, we bedena min kir çar parçeyan*

*û li çar aliyên cîhanê belav kir...*

*Niha jî hûn parçeyên min kom dikin..."*

Gelo çima Rêber Apo bal dikişîne ser dîroka koletiya jinê ku hêna nehatiya nivîsandin? Di dîrokê de çi hat ser serê jinê? Yan jî weke ku Rêbertî jî her tim pirs dike, ***'ÇI HAT SER SERÊ XWEDAWENDÊ?'*** Yek ji erkên bingehîn ya Jineolojî, fêhmkirin û lêkolîna bersiva vê pirsê ye. Heqîqet û dîroka jin ya wundayî dîtin û ronîkirin e.

Gelo çi hişt ku nirx, rastî û dîroka jin wunda bibe? Serdema Civaka xwezayî a ahlaqî-polîtîk ya di bin rêveberiya jinê, di dîrokê de çima û çawa bi dawî bû? Dîsa, di dîrokê de nasnameya **'jina xwedawend'** çima û çawa zîvirî û bû nasnameya **'jina kole'**? Çima zanista heyî ya di bin bandora desthilatdariyê bi hemû hêza xwe dîroka azadiya jin diveşêre û dîrokekî nerast û tijî xapandin li gor xwe çêdike û dide pêş? Çima dixwaze dîroka kolebûna jinan weke çarenûsekê biyolojîk piştrast bike…? **Wê Jineolojî bersiva van pirsan bi dîtin û bi komkirina parçeyên STAR'Ê yên wundayî bide…**

## ***Di Derbarê Jin Û Jineolojî De Nêrînên Rêbertî***




Dîroka koletiya jin bi tundiya li ser jinê destpê dike. Li gor lêkolînên Rêber Apo dîroka tundiya li ser jin diçe heta di dema civaka xwezayî û hîna di wê serdemê destpê dike.

Bi destpêka serdema Sumeran (zilamsalarî) ya B.Z 5.000 sal êrîşên li ser çanda xwedawendî zêdetir û dijwartir dibin. Di kêleka xwedawendên jin yên; evînê, bereketê, jiyan û mirinê, çerxa jiyanê-çerxa felekê, ronahiyê, xwediyê zanistê, parastinê, ax, av, ba û hwd… Ango hemû tiştên ku jiyanê ava dikin û temsîla başiyê ne. Hêzên mêr yên bi taybetmendiyên; şer, ceza kirinê, destdirêjiyê, xwedî hêzên bahoz, lehî, birûsk û hwd. derdikevin pêş. Ango hêzên mêr yên xwedî hemû taybetmendiyên ku zirarê didin jiyanê, civakê û xwezayê. **Wê demê 104 zanistên aîdê STAR’Ê jê tên dizîn û dikevin destê zilamê desthilatdar**. Zanista ku ji aliyê Xwedawendan ve hat pêşxistin û li ser esasê pêşxistina jiyana civakê yanî ‘ji bo na civakê’ û ji bo başiyê hat bikaranîn, piştî ku kete destê mêrê desthilatdar ‘li dijî jiyanê, xweza û li dijî civakê’ bi awayekî xirab hat bikaranîn û ev rewş heta roja me îro jî hîna dewam dike. Zanista heyî ya di bin bandora zîhniyeta desthilatdar a mêr heta roja me îro di her alî de zirarê dide jin, jiyanê, civakê û xweza û cîhan aniye rewşekî ku ber bi tunebûnê ve diçe… Rêber Apo vê dîrokê weke ***‘Çanda destdirêjiyê ya 7 hezar salan’*** bi nav dike.

## *‘Çima Jineolojî?’ Û Girîngiya Xebatên Jineolojî*




**Nîzama serdestî û bindestî yê mêrê desthilatdar a serdema Sûmer (zilamsalarî)**




**Nîzama serdestî û bindestî ê mêrê desthilatdar yê dewletê**

Rahîbê ku xwe di serdema Sûmeran de weke ‘Xwedê’ bi nav kir êrîş bir ser çanda xwedawendî û civaka xwezayî û bi kolekirina jin û di şexsê wê de tevahî civak, nîzamekî nû ya li gorî berjewendiyên xwe a li ser esasê serdestî û bindestî ava kir. Sûmer bû bingeh û destpêka dîroka avabûna dewletê. Di roja me îro de nîzama dewletê jî ji nîzama sûmer şekil girtiye û bi heman zîhniyeta mêrê desthilatdar tê rêvebirin. Zanista girêdayî dewletê bi heman zîhniyeta desthilatdar tê rêvebirin û xizmeta wê nîzamê dike. Dewlet dîroka avabûna dewlet û nîzama dewletê ya desthilatdar weke **‘nîzama jiyanê ya herî pêşketî a di dîroka mirovahiyê’** pênase dike û serdema civaka xwezayî a berî dewletan û dîroka jin weke serdema hov nîşan dide û bi ti awayî behs nake.

## ***'Çima Jineolojî?' Û Girîngiya Xebatên Jineolojî***

Di vê nîzama desthilatdar a dewletê û di jiyana ku ava kir de çi di qadên jiyanê, çi di warê siyasetê, jin li hemû deran bê maf û bê cih tê hiştin. Derve jî û di hundirê malê de jî her tim bi çavekî wûsa li jinê tê meyzekirin ku hebûna wê tenê li ser esasê xizmetkirinê, têkiliya cinsî, ser esasê pêkanîna xwaztekên mêr, keyfxweşiya mêr, xwedîkirina zarokan û jiyana koletiyê ye. Desthilatdarî nasnameya jin ya **'jina xwedawend'** ku jiyan di derdora wê ava dibe û wate û nirxên jiyanê diparêze, veguherand nasnameya **'jina kole'** û di şexsê jinê de êrîşî hemû nirxên jiyanê, tevahiya civakê û wateya rast ya jiyanê dike.

Nasnameya mêr ya **'camêr û mêrxas'** jî veguherand nasnameya **'mêrê serdest û desthilatdar'** ku hebûna wî jî tenê li ser esasê kûrkirin, bihêzkirin û xizmeta ji bo nîzama dewletê yê qirker e. Çawa ku cihê jin di vê nîzama dewletê de nine, esas cihê mêr jî tê de tine. Nîzama desthilatdarî ji mêr re tenê cihekî biçûk di vê nîzama xwe de hiştiye. Ew cih jî mala mêr û malbata mêr e. Bêyî ku mirov û civak di ferqê de be, dewlet bi rêya **'saziya zewac û malbatê' û bi şêwaza şerê taybet-şerê nefsî** heman nîzama xwe di hundirê malbatê de jî ava kir ku armanca wê kûrkirina koletiya jin û civakê ye. **Nîzama malbatê, zewaca temen biçûk, zewaca pirjinî, qedexeya ku jin biçe medresê, jin weke namûs, mal û milk dîtin… Ew hemû nîşaneyên kolekirina jin û civakê ne.**



**NÎZAMA DESTHILATDAR DI HUNDIRÊ MALBATÊ**














## ‘Çima Jineolojî?’ Û Girîngiya Xebatên Jineolojî





Di civaka xwezayî de di navbera civak û xweza de hevsengî hebû. Nîzama wê bi şeklê ‘gilover’ bû. Wateya wê; wekhevî, hezkirina hevdû, nirx û qîmeta hevdû û hertiştî zanîn e. Demokratîk e û hevdû temam dike.

Nîzama zîhniyeta desthilatdar bi şeklê ‘sêkoşe’ ye. Wateya wê; desthilatdarî, feraseta ‘spî û reş’ e, hevsengiya di navbera mirov û xweza xira dike, tenê yek kes esas digire û ew kes dest davêje ser hertiştî. Hertişt di bin hakîmyeta yek kesî tenê de ye.

Di encama bandora desthilatdarî de têkiliya wekhev û azad a di navbera jin û mêr xira bû. Heman demê de têkiliya di navbera mirov bi xwe re, têkiliya mirov û xweza, mirov û civakê jî xira bû.





## ***'Çima Jineolojî?' Û Girîngiya Xebatên Jineolojî***



Li hember vê pergala desthilatdar yê mêrê serdest û ji bo pêşî li qirkirina jin, civak û xwezayê girtinê, Rêber Apo ***paradîgma ya civaka demokratîk û ekolojîk (xwezaparêz) ya xwe dispêre azadiya jin pêş xist***. Xeta Rêber Apo ya Moderníteya Demokratîk ku bi felsefa ***'Jin Jiyan Azadî'*** mîsoger dibe çareseriya krîz û kaosa serdemê ye û dawî bi nîzama desthilatdarî tîne. Armanca felsefa Rêber Apo azadiya jin û vejîna şoreşa jin di sedsala 21.mîn e. Yanî bi pêşengtiya jina azad mîsogerkirina azadiya civakê û jiyana azad e ku di derdora jin ava dibe. Rêber Apo Jineolojî weke zanista vê xetê diyar kir û bi keda dehan salane pêş xist.



### ***JIN Û CIVAK***

Di nîzama xeta Moderníteya Demokratîk de Jin û Civak tên esas girtin û li gorî pêdiviyên jin û civak, parastin û ewlehiya xweza tevgerandin çê dibe û biryar tên girtin.

# 2. BINGEHÊN JINEOLOJÎ

## *Ceribandin Û Tecrûbeyên Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê*









Jineolojî li ser sê bingehan xwe ava dike. Bingeha **yekemîn û esasî** ya Jineolojî **'Ceribandin Û Tecrûbeyên Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê'** ye. Rêbertî cara ewil pirsgirêka jin di salên 1987-1990'î bi mijara jin û malbat tîne ser ziman û ew dibe bingeha ku di aliyê îdeolojîk de kûrtir li ser vê mijarê xebat were pêşxistin. Serokatî bi rastiya malbatê destpê dike û dema tê de kûr dibe, digihêje pirsgirêka azadiya jinê. Li ser vê esasê tehlîla ***'Li Kurdistanê Jin û Malbat'*** dike. Rastiya gelê Kurd û Kurdistanê, têkiliyên ku di malbatê de hene, têkilî û pirsgirêkên di navbera jin û mêr yên derdora wî û hwd. ew nakokî hemû bûn bingehê ku kevirê Jineolojî were danîn. Ji taximên jinan yên destpêkê heta konfederalîzma jinan; Jineolojî li ser tecrûbeya Tevgera Azadiya Jinên Kurdistanê pêş dikeve. Tecrûbeyên artêşbûna jin, partîbûna jin, temsîla wekhev, hevjiyana azad… dibe bîrdoziyên bingehîn ku Jineolojî li ser wê kûr dibe.

## ***Zanînên Çanda Xwedawendî Û Civaka Xwezayî***





Bingehê **duyemîn** ya Jineolojî **‘Zanînên Çanda Xwedawendî Û Civaka Xwezayî’** ye.

Berhem, bermahî û şopên şoreşa serdema civaka xwezayî ya jinê ku di xebatên kolandina bin erd hatine derxistin, şop û bermahiyên wan di civakên çanda kevnar, destan û çîrokên aîdê wê çandê ku heta roja me îro hatine parastin, qewl û dengbêjiyên ku xwe dispêrin wê, lêkolîna zimanê civakên çanda kevnar û gelek tiştên din ji Jineolojî re dibin rêbazên lêkolîna heqîqeta jin û dîroka jin. Ji ber ku dîroka jin li ser axa Rojhilata Navîn destpêkir, gelek berhemên wê dîrokê li seranserî vî welatî û derveyî welat hatine dîtin ku ji Jineolojî re dibin çavkanî. Dîsa, her çiqasî zîhniyeta desthilatdar bandor li ser civak, çand û bawerî kiribe jî, civakên xwedî dîroka vê çanda kevnar gelek heqîqet û berhemên wê çandê parastine û ew jî ji Jineolojî re dibin rênîşandan. Bi derketina Tevgera Azadiya Kurd û bi pêşengtiya Tevgera Azadiya Jin, ew axa Rojhilata Navîn ya bi berhem cardin bû tov û ji nû ve şîn bû. **Bi vî rengî Jineolojî namzete ku hem dîroka koletiya jin hem jî dîroka azadiya jin binivisîne…**

## Berxwedan Û Têkoşînên Jinên Cîhanê



Bingehê **sêyemîn** ya Jineolojî **'Berxwedan Û Têkoşînên Jinên Cîhanê'** ye.

Jineolojî berxwedan, têkoşîn û serhildanên jinan yên hezaran salan heta roja me îro yên jinên feylezof, femînîst, sosyalîst, tevgerên jinan û hwd. li hember nîzama desthilatdar weke bingeha tecrûbe û lêkolînên xwe digire dest. Dîsa, Jineolojî têkiliya xwe bi wan jinan û tevgerên jinan re pêş dixîne û tifaqa jinên cîhanî weke armanceke xwe ya bingehîn dipejirîne.


"Em kengî bi vê
perspektîfa felsefîk berê
xwe bidin rastiya jinê,
em ê bigihêjin wê
encamê ku divê têkiliya
jiyana manedar bi aliyên
jinê yên xweşik, rast û
baş bêne pêşxistin..."
Rêber Apo
عندما نتمكن من الوصول
بهذا التوجيه الفلسفي إلى
حقيقة المرأة، حينها
سوف نتمكن من الوصول
إلى نتائج التي من
الواجب علينا تطوير
علاقات الحياة المغنية
بجوانب أخرى مع المرأة
من ناحية الجمال، الحقيقة
والصواب... القائد أبو..

## مقاومة ونضال المرأة فى العالم.










القاعدة الثالثة لعلم المرأة، مقاومة ونضال المرأة في العالم،

تتخذ علم المرأة من مقاومة ونضال وانتفاضات المرأة القائمة منذ الاف سنين حتى يومنا الحالي من فلاسفة، حركات المرأة الفامينية، الاشتراكية وحركات الاخرة كأساس وتجربة لبحث ضد نظام الذهنية السلطوية. حيث يقوم علم المرأة بترسيخ وتطوير علاقتها مع تلك نساء وحركات الاخرة، وتقوم بقبول اتفاقياتها مع المرأة في العالم كهدف أساسي لها.

## علم وثقافة الإلهة ومجتمع (طبيعي)




**القاعدة** ثانية لعلم المرأة، هي معلومات عن ثقافة الهة ومجتمع الطبيعي،

**الإنتاج** وميراث ثورة عصر المجتمع الطبيعي العائدة لا المرأة العاملة في الاعمال الاثرية التي تم كشفها، باتت هذا الاثار ومنجزات بنسبة لا المجتمعات الثقافية القديمة كذلك ملاحمها وقصصها التي تم الحفاظ عليها وحمايتها إلى يومنا الحالي من خلال اقاويل واغاني الشعبية التي تقوم أبا ستناد عليها حيث باتت البحث عن لغة المجتمعات الثقافية القديمة والعديد من أشياء الاخرة بمثابة وسيلة وطريقة لعلم المرأة من لأجل البحث عن حقيقة المرأة وتاريخ المرأة. وسبب يعود في ذلك إلى انطلاق بدية تاريخ المرأة على جغرافية الشرق الأوسط وقد تم الكشف عن العديد من الإنجازات هذا التاريخ على كافة جوانب هذه الأوطان وخارجها والتي أضحت مصدر ومنبع لعلم المرأة. وبتالي مهما كانت لذهنية الذكورية تأثير على ثقافة ومعتقدات هذا المجتمع لان انه قام بحفاظ على العديد من حقائق ونتاج هذه الثقافة القديمة ويعد هذا شيء بنسبة لعلم المرأة دليل وموجه لها لهذا امست ظهور حركة حرية الكرد بريادة حركة حرية المرأة بمثابة إنعاش ارض الشرق الأوسط وجذورها من جديد. بهذا شكل تمكنت علم المرأة من إضفاء بصمتها على كتابة تاريخ عبودية المرأة كذلك على تاريخ حريتها ايضاً...

## 2. اختبار وتجارب حركة حرية المرأة الكردستانية،

***يتم بناء علم المرأة على ثلاث قواعد.***














القاعدة الأولى والاساسية لعلم المرأة هي" الاختبارات والإنجازات في حركة حرية المرأة الكردستانية. حيث يتطرق القائد إلى ذكر مسائلة المرأة لأول مرة في أعوام (1987) 1990) من خلال موضوع المرأة العائلة حيث يصبح الأساس في تطوير الجانب الأيديولوجي وتعمق بها في هذا الموضوع. يبدأ القائد بهذا الشيء من خلال دراسة حقيقة العائلة وعندما يقوم بالتعمق بها يتواصل منها إلى مسالة حرية المرأة والعائلة في كردستان وحقيقة الشعب الكردي والكردستاني. العلاقات المتواجدة ضمن العائلة. المشاكل العالقة بين الرجل والمرأة والتي تدور حولها. الخ...

أدت جميع التناقضات إلى وضع حجر الأساس لعلم المرأة حيث تقوم علم المرأة بتطوير نفسها بدءً من تواخم المرأة امتداداً لكونفدرالية المرأة حيث تتطور تجاربها في حركة حرية المرأة الكردستانية. حيث تمسي تجارب تجيش المرأة، تحزب المرأة، ممثلة المساواة، الحياة الندية الحرة، أيديولوجية وقاعدة بالنسبة لعلم المرأة لأجل تعمق بها.

## لماذا علم المرأة؟ وما هيه أهمية اعمال علم المرأة.



علن القائد عبد الله اوجلان" من اجل الوقوف ضد نظام السلطة للرجل الحاكم وسد طريق امام إبادة المرأة والمجتمع والطبيعة وإلى تطوير براديغما القائمة على بناء مجتمع ديمقراطي وحماية البيئة التي تستند إلى حرية المرأة" حيث يعتبر خط القائد في العصرانية الديمقراطية القائمة على فلسفة "المرأة" حياة" الحرية" إلى ضمان معالجة الازمة والفوضى المتعاصرة وانهاء النظام السلطوي. وبالتالي فان هدف القائد من هذه الفلسفة هي الوصول إلى حرية المرأة وانبعاث ثورة المرأة في القرن الواحد والعشرون. يعني سيتم ضمان حرية المجتمع والمرأة الحرة بطليعة المرأة والتي سيتم بنائها حول المرأة. عمل القائد إلى اعتبار علم المرأة كعلم لهذا الخط وقام بتطويرها عبر جهد وكدح عشرات السنين.



***" المرأة والمجتمع"***

تتخذ المرأة والمجتمع تأسس ضمن نظام خط العصرانية الديمقراطية ويتم تامين الحماية والامن للمرأة والمجتمع والطبيعة وفق هذا الشيء واتخاذ القرار على هذا الأساس.

## لماذا علم المرأة؟ وما هيه أهمية اعمال علم المرأة،



يعتبر نظام الذهنية السلطوية على شكل مثلث" حيث تردف معنى سلطويتها ومفهومها الأبيض والأسود إلى تخريب التوازن القائم بين الإنسان والطبيعة.



يتواجد توازن ضمن المجتمع الطبيعي بين المجتمع والطبيعة. حيث كانت نظامها على شكل دائري. حين أدركت معناها، المساواة، الحب المتبادل، القيم، واتمام بعضهم عبر الديمقراطية.

**تعتر**ف بالفردية ف أدت السلطوية في النتيجة إلى اختلال علاقة ومساوة والحرية بين الرجل والمرأة كما أدت إلى تخريب علاقة الإنسان مع نفسه وعلاقة لإنسان مع الطبيعة والمجتمع.

**قد** وتسمح بالاستلاء على كل شيء. وتجعل كل شيء تحت سيطرته.


















## ***لماذا علم المرأة؟ وما هيه أهمية عمل علم المرأة.***

**في** نظام الدولة السلطوية والحياة التي قامت بأنشائها سواء في ميادين الحياة او الميدان السياسي والمرأة إلى سلب جميع حقوقها منها كما نظرت دائماً إلى المرأة سواء خارج او داخل المنزل على مجرد وجود تم خلقها لأجل الخدمة. العلاقة الجنسية. تلبية متطلبات الرجل. تامين السعادة للرجل. تربية الأطفال وحياة المستعبدة. عملت الذهنية السلطوية إلى تحويل هوية المرأة القائم على (المرأة الالهة) التي تنعش الحياة من حولها وتحمي معنى وقيم الحياة إلى هوية" المرأة المستعبدة" وقامت من خلال الهجوم على شخصية المرأة بالهجوم على جميع قيم الحياة وكافة المجتمعات والمعنى الصحيح للحياة.

**كما** قامت بتحويل هوية الرجل القائمة على **" الكريم" الشجاع"** إلى هوية **(الرجل المتسلط والسائد)** التي تحتكر وجودها فقط على أساس التعمق. الحب وخدمة من الجل نظام الدولة المستبدة. كيف لم تعد للمرأة وجود في هذا النظام السلطوي للرجل سوى مكان صغير في هذا النظام. هذا المكان يشكل منزل الرجل وعائلة الرجل. وبدون ان تمتلك المجتمع دراية بذلك تلجئ الدولة إلى بناء نظامها داخل العائلة عن طريق مؤسسة الزواج والعائلة وتسعى من خلال اسلوبها في حرب الخاصة والحرب النفسية إلى تعميق عبودية المرأة، الزواج بعمر صغير، تعدد الزوجات، منع الفتيات من دراسة، واعتبار المرأة مصدر الشرف. إيجاد المرأة مال وملكية. كل هذه الأشياء يشير على عبودية المرأة والمجتمع.



**" نظام السلطة داخل العائلة**

## لماذا علم المرأة؟ وما هيه أهمية اعمال علم المرأة.





راهب/السلطة

المتدين / مساعدين

العمال / الخدم

المرأة والمجتمع.
العبيد

نظام الظالم والمظلوم في ظل حكم الرجل السلطوي بأعصر السومري (الرجل





الرجل السائد صاحب
الذهنية سلطوية

الجيش، الشرطة، الأحزاب، المتحالفين مع
الرجل السلطوي،

"العامل، الخدم، والعبيد، في نظام رجل
السائد.

"المرأة والمجتمع ضحية ضمن
نظام الدولة.

نظام الظالم والمظلوم للرجل السلطوي فى الدولة،

عهد الراهبان الذين عملوا إلى تسمية أنفسهم باله في ظل العهد السومري إلى المهاجمة على ثقافة الالهات والمجتمع الطبيعي وقامت ببناء نظام جديد بحسب مصالحهم على أساس ونظام طبقي عن طريق استعباد المرأة والمجتمع. حيث أصبحت السومريين أساس بداية تاريخ وبناء الدولة. وبالتالي يتم سير نظام الدولة حتى يومنا الرهن بحسب شكل الدولة في عهد السومري بالإضافة إلى ادارتها بنفس الذهنية الذكورية للسلطة الحاكمة. كذلك العلم المرتبط بالدولة يتم اخده بنفس الذهنية السلطوية وتقوم بخدمة نظامها السلطوي بمثابة نظام الحياة الأكثر تقدماً عبر التاريخ الإنساني. واعتبار تاريخ عصر المجتمع الطبيعي من قبل الدولة وتاريخ المرأة على انها عصر وحشي ولم تقم بالبحث او الإشارة إليها.

## تقييمات، القائد، آبو، بخصوص علم المرأة.





**بداة** تاريخ عبودية المرأة عن طريق الشدة المفروضة على المرأة. وبحسب أبحاث القائد تعود تاريخ الشدة الممارس على المرأة إلى عصر المجتمع الطبيعي حيث بداة منذ ذلك العصر. منذ عهد السومريين (الرجل القيادي) **ق. م. 5000** سنة. فان الهجمات على ثقافة الالهة يصبح أكثر صعوبة. إلى جانب ربانية المرأة صاحبة الخصائص مثل، الحب، البركة، الحياة والموت، دورة الحياة والفلك، النور، صاحبة العلم، حاميات الأرض والماء والهواء. الخ..... يعني جميع الأشياء التي تقوم بناء الحياة تمثل الخير.

**جميع** خصائص الرجل وقوته القائمة على الحرب. العقاب. الاعتداء. الفيضان. الرعد. وإلى اخره. جميع خصائص المتعلقة بالرجل السلطوي صاحب جميع الخصائص التي تتسبب بالإضرار للحياة والمجتمع والطبيعة. في ذلك الاثناء يقومون بسرقة **(104)** علوم العائدة لستار وتدخل تحت سلطة الرجل الحاكم. يعني العلوم التي تم استخدامها بيد الالهة وتم تطويرها في سبيل الحياة والمجتمع. أي استخدامها من اجل المجتمع وخيرها. ولكن بعد ان تم سلبها من قبل السلطة الرجولية أضحت وسيلة ضد الحياة والمجتمع وتم استخدامها بصورة سلبية وتخريبية. هذا الشيء جاري ويمتد حتى يومنا الحالي. وماتزال العلم الحالي المتأثر بالذهنية السلطوية للذهنية الذكورية وتمتد حتى يومنا الحالي وتتسبب من كافة الجوانب على المرأة، الحياة، المجتمع الطبيعة والعالم إلى درجة وصل بها الامر إلى المطاف.

" **يتطر**ق القائد عبد الله اوجلان" إلى تسمية هذا التاريخ بمثابة الثقافة التي تم اغتصابها منذ سبعة الاف سنة"

## ***تقييمات، ق، عبد الله اوجلان، بخصوص المرأة وعلم المرأة***



***" لم يتم كتابة تاريخ عبودية المرأة وتاريخ حريتها ماتزال في طريقها للكتابة. طبعاً تاريخ عبودية المرأة مخفي في ثقافة الشرق الأوسط لأجل هذا السبب سوف يكون ظهورها على هذا الأرض ايضاً.***

**عجباً** لماذا يلفت "القائد آبو". الانتباه إلى تاريخ عبودية المرأة ولماذا لم يتم كتابتها بعد؟ ما الذي حدث للمرأة عبر تاريخ؟ او كما يتطرق إليها القائد ويقوم بالسؤال ما لذي حصل للالهات عبر التاريخ؟ وبالتالي يعتبر من واجبات علم المرأة الأساسي هي فهم والبحث عن إجابة هذا السؤال. تنوير وإيجاد حقيقة وتاريخ المرأة الضائع. ما لذي جعل من حقيقة. وقيم وتاريخ المرأة يتعرض للضائع. لماذا وكيف وما هي الأسباب التي أدت إلى انهاء المجتمع الطبيعي الأخلاقي. السياسي تحت إدارة المرأة عبر التاريخ؟

**كيف** تحولت هوية المرأة الهة ولماذا تحولت إلى هوية المرأة العبدة عبر التاريخ؟

**لماذا** يلجأ العالم الحالي المتأثر بالذهنية السلطوية بجمع قوتها إلى إخفاء تاريخ حرية المرأة وإبراز تاريخ غير حقيقي قائم على الخداع إلى الوسط؟ لماذا ترغب في جعل تاريخ عبودية المرأة كمصير بيولوجي داعم؟ سوف تتحمل علم المرأة مسؤولية الإجابة على هذه الأسئلة عن طريق جمع أجزاء ستار التي تعرضت للضياع.

سوف تتشكل علم المرأة انطلاقة وطهور أساسي لها" القائد آبو"

"انا إلهة ستار،

" انا حياة"

" أنتم تتدعون بأنني ميتة، أنا القانون،

"لقد رأيتموني، وقطعتم جسدي لا أربع أجزاء،

" وقمتم بتوزيعها على أربع أجزاء العالم،

" حالياً تقومون بجمع هذه الاشلاء،








Al-Lat and Al-'Uzzá and Manāt






a
b







## ***تقييمات قائد " عبد الله اوجلان" حول المرأة وعلم المرأة.***

***" تم ولادة عبودية المرأة على ارض الشرق الووسط لهذا السبب سوف يتم تصحيح هذا الشيء ايضاً على هذا الأرض" القائد آبو"***



**في** ظل عصر" المجتمع الطبيعي" الذي محنى عليها الاف السنين. تم روية الخصائص المتعلقة بالمرأة. الجسدية منها. الشخصية. الحواس وطاقة التي تم هدرها وعلاقتها الأخلاقية والسياسية امام المجتمع والحياة والطبيعة ولأجل ارتباط وعلاقة جسد المرأة بالكون والطبيعة وعلومها المرتبط بسر الكون والحياة بالأخص إنجابها للأطفال ولأجل العديد من الأسباب في المجتمع يتم رويتها مقدماً. وفي نفس المنوال كانت هناك الكثير من الأمثلة عن الثورة منها ثورة التكنولوجيا. ثورة الزراعة. التدجين الحيوانات. تطوير وتقدم اللغة. الاقتصاد. السياسة. الثقافة. الفن والموسيقا. كذلك ثورة العلم مثل الرياضيات. الكيمياء. الفلك. الكوسموس. الخ.........

**يتم** تطويرها من جانب المرأة لأجل هذا السبب أطلق القائد على ذلك العصر (ب عصر ثورة المرأة) والتي تم تطويرها وخلقها حول المرأة.

**لهذا** أطلق المجتمع على المرأة هوية الالهة وقامت المرأة بتأدية واجبها ومسؤولياتها في الإدارة تجاه المجتمع. وقد تم على إثر ذلك بناء المجتمع الأخلاقي. سياسي ضمن معايير ديمقراطية. مساواة. السلام. والحرية. وذلك تحت ريادة وقيادة المرأة. وذلك تحت فلسفة قائمة على شعار الكل من اجل واحد وواحد من اجل الجميع كانت الاجتماعية. وقيم المجتمع تعتبر تشكل ثقافة ومعنى مقدس للحياة في ذلك المجتمع.

## ***تقييمات القائد "عبد الله اوجلان" حول المرأة وعلم المرأة***



***الإلهات يعتبرن من الأشياء الإلهية، تلك النساء اللواتي قاموا بتطوير الثورة النيوليتية. تلك الأشياء التي قامت بتمثيل دورة الحياة تعتبر كل ذلك مقدسة ".. القائد عبد الله اوجلان..***

***" يتوجب على المرأة الوصول بنفسها إلى مستوى العصر الذي كان الجميع يلتف فيما حولها "القائد***

***تطوير العلم حول المرأة، تعد الخطوة الأولى نحو سوسيولوجيا الاجتماعية الصحيحة. " القائد عبد الله اوجلان، "***

**يجب** ان لا تقتصر دور المرأة على مجرد كائن وجنس، كذلك ألا تقتصر فقط على البحث عنها في هذا الجانب. إنما يتوجب تناولها بصورة ابعد من ذلك بحيث تشمل نتاج المرأة وتقييم جوهر المجتمع وتنوير هوية المرأة من الناحية التاريخية، مرتبط بذلك لم تقم بتقديم معالجة المشاكل الاجتماعية. بدل القيام بحماية حقيقة وقيم الحياة. التاريخ المجتمع وإعطاء المعنى عبر العصر الحالي للحياة من جديد، الا انه العلم الذي يسود تحت تأثير الذهنية السلطوية كلما تتقدم تفقد الحياة معناها الحقيقي وتقوم عبر استعباد المرأة وسلب حقوقها إلى استعباد كافة المجتمع. ايضاً من جانب اخر يشمل حقيقة المرأة في ظل القرن الواحد والعشرون تحت طليعة المرأة الحرة واسقاط النظام السلطوي وضمان ثورة حرية المرأة.

## ***تقييمات القائد عبد الله اوجلان بخصوص المرأة وعلم المرأة***






**آلهة الحب والحماية، عشتار" ستار"**

**يتطرق** القائد إلى نقد علم المجتمع والاجتماع قائلاً ***" إذا كان علم الاجتماع من اجل المجتمع، فلماذا لا يوجد البحث عن المرأة؟ ولا يكون البحث عن الحياة متشابهة. وبالتالي فان الحلول التي يقوم بتقديمها لا تستطيع المعالجة، إنما بالعكس فأنها تؤدي إلى تعمق المشكلة أكثر"***

**يعتبر** اليهوديين عبر التاريخ من الشعوب الأولى التي قامت بأعمال الحفر والتنقيب في الأرض. وقد كانوا يصرون على إنهم من الشعوب الأولى التي بدأت بهم الحياة. تمكنوا حينها اثناء الحفر من العثور على تمثال الآلهة عشتار (ستار) ولأنها كانت عارية أطلقوا عليها **" المرأة الوحشية "**إلا إنها تمثل في جوهرها تمثال ستار الذي يرمز إلى البركة. وبهذا الشكل تم شرح وتعريف معنى وحقيقة العديد من الميراث التاريخي القديم بصورة مخالفة لحقيقتها والعمل على إخفاء حقيقة وتاريخ المرأة في الظلام وعدم إظهار معالمها وتعريفها وفق الذهنية الذكورية الحاكمة. أي يتم سير العلم الحالي في وقتنا الراهن برؤيا الرجل ويتم إدارتها تحت تأثير الذهنية السلطوية.

تتمتع الآلهة ستار ضمن مجتمعات شعبنا الكردي والأيزيدية بمكانة وقيمة عالية ويتم مراودة اسمها حتى يومنا الحالي مثل " يا ستار " بين المجتمع. ويتم التطرق إلى ذكر الآلهة ستار بين الاقوال الأيزيدية بهذه الصورة " يا آلهة جبال عبد العزيز، جبال شنكال وجبال مقلوب (وهي قريبة من لالش النوراني) لأجل جلب الحماية على وجه الأرض. يعتبر الجبال الثلاثة بمثابة السكك التي تثبت بها خيمة ستار"

## تقييمات القائد "عبد الله اوجلان" حول المرأة وعلم المرأة "



**هناك** الكثير من انتقادات القائد "عبد الله اوجلان فيما يخص العلوم الحالية. حيث يتوجب على العلم في هذه الحالة القيام بلعب دورها في الحياة والقيام بتحليل ومعالجة المشاكل الحياتية والاجتماعية بصورة صحيحة وتنوير الحياة. ولابد للعلم من تنوير الحقيقة وإظهارها إلى الوسط. ولكن بعد تأثير الذهنية السلطوية على العلم أدى ذلك إلى تعريض طرق العلم في البحث وتحليل مشاكل المجتمع إلى تلقي انتقادات كبيرة. وبالتالي بدل اللجوء إلى حل ومعالجة المشاكل الحالية عن طريق العلم إلى زيادة تعمقها وصعوبتها.

**يعتبر** نيتشه عبر التاريخ واحد من الفلاسفة الذين قاموا بانتقاد هذا العلم و تطرق إلى القول " جميع الأشياء التي تم سردها لنا كاذبة ٬ و بالتالي كل من يسعى إلى الوصول إلى الحقيقة يتوجب عليه البحث من الجذور " يتطرق القائد بخصوص نيتشه بهذا الإطار إلى القول **" البحث الذي لا يستند إلى حقيقة المرأة لا يمكنها الوصول إلى الحقيقة ٬ النضال الذي لا يستند إلى حرية المرأة لا يمكنها الوصول إلى النصر "** بينما يتطرق نيتشه إلى القول بانه يتوجب علينا البحث من الجذور للوصول إلى الحقيقة ٬ و لكن هذه المقولة يتم انعكاسها في منهج القائد ؛ القائمة على البحث بالجذور عبر وضع المرأة . كيف كانت بداية المرأة وماذا طرأ عليها فيما بعد لابد لنا من البحث بهذا

**الخصوص** وفهمها، بإمكان المرء في هذه الحالة الوصول بنفسه إلى الحقيقة ٬ يعني يعتبر البحث في الجذور بحسب منهج القائد شيء صحيح ولكن البحث في جذور تاريخ المرأة هي الأساس. لذا يعتبر الوجود الذي تعرض بصورة أكبر للكذب والخداع سوف يستحوذ على الأولوية في البحث عن الحقيقة. لهذا السبب تتضمن علم المرأة كمصطلح على معنى فلسفي كبير.

**1. تعريف علم المرأة.**

## ***معنى علم المرأة.***




**لقد** تم ذكر مصطلح، علم المرأة، لأول مرة من جانب القائد عبد الله اوجلان في عام 2008 في المرافعة الثالثة تحت عنوان سوسيولوجيا الحرية.

**"جن"** باللغة الكردية يعني "المرأة " **لوجي** "**باللغة** اللاتينية **يعني** "العلم"، وككلمة تعني علم المرأة. إلا إن القائد يتطرق إلى ربط جذور كلمات المرأة، الحياة مع بعضها. لهذا السبب تقتبس علم المرأة معناها من علم المرأة وعلم الحياة.

تتناول علم المرأة بهذه الصورة فيما بينها جميع ميادين الحياة بفروعها التاريخية، الاقتصادية، الجمال والاخلاق، السياسة، البيئة، الصحة، الديموغرافية والدفاع. كما تتضمن من جانب أخر العصرانية الديمقراطية والتي تعد أساس علم الامة الديمقراطية، علم المجتمع الأخلاقي والسياسي، الحياة الندية الحرة وعلم الاجتماع بالمختصر المفيد تعتبر علم ثورة المرأة وثورة الحياة.

# المحتوى:

## 1. ماهية علم المرأة

- معنى ' علم المرأة '
- تقييمات القائد بخصوص المرأة وعلم المرأة.
- لماذا علم المرأة؟ وماهية اهمية نشاطات علم المرأة.

## 2. اساس علم المرأة.

- تجارب واختبارات حركة حرية المرأة الكردستانية
- معارف الثقافة إلهية والمجتمع الطبيعي.
- مقاومة ونضال المرأة في العالم.



اهداء لروح شهداء الحقيقة، الشهيدة ناكيهان اكارسو وجميع النساء المناضلات.

# ماهية علم المرأة.

## القسم الأول:

*اكاديمية علم المرأة في شنكال:*

Jineolojî

# علم المرأة.

